

## Serdana Pirtûkxaneyê

1. Yê biçûk û yê mezin di deriyê pirtûkxaneyê re dikevin hundir û heyran heyran li derûdora xwe dinêrin.
2. Yê mezin: "Erekê, li vir binêre, çiqase gelek pirtûk û mirov hene!"
3. Yê biçûk: "Binêre, li aliyê pêş erkdarapirtûkxaneyê heye. Ez bawer im, wê ji me re bibe alîkar."
4. Erkdara pirtûkxaneyê: "Hûn bi xêrê hatin. Çawa dikarin ji we re bibim alîkar?"
5. Yê mezin: "Ji te, ev qerta min e. Em dixwazin ji xwe re pirtûkan bistînin."
6. Erkdara pirtûkxaneyê agahiyan derbasî ser kompûterê dike û qerta pirtûkxaneyê derdixe. Qertê dide destê yê mezin.
7. Erkdara pirtûkxaneyê: "Bi vê qertê hûn dikarin pirtûk û alavên din ên pêdiviya we pê heye, ji xwe re bistînin."
8. Yê mezin û yê biçûk dest pê dikin, li pirtûkxaneyê digerin.
9. Refik tev tije pirtûk in. Mirov li pirtûkan dinêrin û pelên wan li hev diqulipînin. Bi ser de fîlm û CD jî hene!
10. Yê biçûk: Ka li vir binêre, ev fîlmê ku ez herî zêde jê hez dikim e! Ez dixwazim vê bistînim.
11. Piştî ku hinekî din dimeşin, li cem komên rûniştine, yekî rojnameyê dixwîne dibînin. Yekî din jî hewl dide li ser înternetê agahiyan bibîne.
12. Yek li vê derê ji zarokan re çîrokan dixwîne. Zarok bi heyecan lê guhdarî dikin.
13. Hinekî din pêşdetir, li ser maseyên xebatê jî kesên dixwînin û dinivîsînin hene.
14. Yê mezin hîn pirtûka lê digere nedîtiye.
15. Yê mezin: "De ka were!"
16. Ji erkdarê pirtûkxaneyê yê li ser pêlikan rawestiyaye dipirse.
17. Yê mezin: "Ez nizanim bê dikarin vê pirtûkê li ku bibînim."
18. Erkdarê pirtûkxaneyê: "Ji kerema xwe re, bi min re werin."
19. Bi meşê refikên pirtûkxaneyê derbas dikin.

20. Erkdarê pirtûkxaneyê: “Fermo! Pirtûka hûn dixwazin.”
21. Yê mezin: “Spas dikim!”
22. Her du ber bi pêşwazîgeha pirtûkxaneyê ve dimeşin; pirtûk, fîlm û qerta pirtûkxaneyê datînin ser dezgehê. Erkdara pirtûkxaneyê alavên anîne qeyd dike û hemûyan tevî qerta pirtûkxaneyê dîsa dide wan. Wekî din ji wan re rave dike bê alavên bi deyn sitendine divê kengî vegeŕînin pirtûkxaneyê.
23. Yê mezin û yê biçûk ji wir vediqetin. Lê belê bi dilxweşî ewê careke din dîsa werin!

*Text: Bibliomedia Schweiz / Februar 2017 Übersetzung: Hesên Huseyîn Denîz*